Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1104 | 1-Cotmeh- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# Ji bo jinan derfetên kar têne avakirin

**Bi armanca xurtkirina aboriya jin komîteya aborî ya girêdayî Kongra Star li kantona Kobanê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hewil dide projeyên aborî û çandiniyê ên cuda pêşkêşî jinan bike.**

Bi destpêka şoreşa 19`ê Tîrmeha 2012'an de, tevlî ku pisporî û ezmûnên wan zêde jî nebûn jin beşdarî hemû qadên şoreşê bûn û rola wan di pêşxistina aboriya herêmê de zêde bû, bi însyatîfa Kongra Star bi riya komîteya aborî ji bo sîstema aboriya serbixwe li herêmên Bakur û Rojhilatî Sûriyê jinan rêxistin dike.

**'Armanca me xurtkirina aboriya jinê ye'**

Rêvebera Komîteya Aborî ya Kongra Star Hêvîn Mustefa derbarê kar û xebatên komîteyê de wiha got: "Bi destpêka şoreşa 19'ê Tîrmehê hişyariya fikrî li gel jinan zêdebû. Da jin di gelek saziyan û pîşeyan de kar dikin û civakê birêve dibin. Bi wan pêşketinan Kongra Star gelek komîte avakirin û komîteya aborî rola xwe di proje û xurtkirina aboriya jin de lîst.

Gelek projeyên piştgiriya aboriya jinê hatin pêşkêşkirin û pêkanîn, ku derfetên kar zêde bûn. Ji çend projeyên ku di sala 2023'an hate kirin em dikarin wiha bi rêz bikin; Tevî vekirina werşeyên dirûnê, firna nan, xwaringeh, navendên xemilandinê û projeyên çandiniyê jî hatin pêşkêş kirin. Piraniya projeyên hatine pêşkêş kirin li gor pêdiviyê jinên di nav civakê de hatin lêkolînkirin. Zêdetirî 150 jin di projeyên komîteya aborî de kar dikin, em hewil didin derfetên kar ji bo jinên derveyî mal jî peyda bikin. "

**'Em hewil didin komîteya xwe berfireh bikin'**

Endama Komîteya Aborî ya Kongra



ku bikarin hevjiyaneke hevpar ava bikin û wekheviya navbera herdû aliyan de pêkbînin êdî dikarîn mafên xwe bixwazin û tevlî hemû qadan bibin."

Hêvîn Mustefa di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku ji bo jinên şerê hişmendiya mêrsalarî û kevneşopên civakî dikin aborî warekî gelekî girîng e û wiha pê da çû: "Jin di warê aborî, fikrî û siyasî de dikare şerê hişmendiya mêr bike. Beriya hezar salan jin aborî keşif kiriye, lê bi derketina hişmendiya mêrsalarî û pêşketina sîstema kapîtalîst rola jinê hate paşguh kirin."

**'Bi projeyan gelek derfetên kar zêde bû'**

Hêvîn Mustefa amaje bi vê yekê kir ku jinên herêma Firatê di nava kar û xebatan de rastî gelek astengiyên civakê hatine û gotina xwe wiha domand: "Berê jin di malan de dihiştin û erkên wê tenê parastina zarokan bû, lê îroj em dibînin

Star Hêza Şêx Bozan jî armanca komîteyê anî ser ziman û wiha got: "Ev proje serxwebûna jinan ava dike, armanca me piştgiriya jinane û peyîdakirina derfetên kar e, komîte deriyên xwe ji bo pêşketina fikrî û pratîkî re vedike. Tevlîbûna jinan a di nav projeyê de hişyariya wan derdixe pêş. Em hewil didin hejmarek jinan tevlî komîteyê bikin."

**'Bi saya komîteya aborî êdî ez ne hewcedarî tu kesî me'**

Karmenda salona xemilandina jinan ya girêdayî komîteya aborî ya Kongra Star Zêneb Welîd wiha diyar kir û got: "Ev nêzî 10 mehan e min dest bi karê salona xemlandina jinan û werşeya dirûnê kiriye, em jinan perwerde dikin û fêrî kar dikin. Her du mehan komek jin tên perwerde kirin, di rojên bê de 4 ji beşa dirûnê û 13 perwerdekar ji beşa xemilandina jinan wê derbiçin. Piştî derçûnê komîteya aborî derfetên kar ji wan re ava dike, ez bi karê xwe kêfxweşim, ji ber ku êdî ez ne hewcedarî tu kesî me."

# Li Şengalê dema çinîna hêjîran e

Şengal ku bi hêjîrên xwe yên xweş tê nasîn, îsal jî berhemeke baş da. Cotkarên Deşta Warê Xidirê ku mijûlê çinîn û hişk kirina hêjîranin, kêfxweşiya xwe ya ji berhemên îsal anîn ziman û dan zanîn ku berhemên wan li derveyî Şengalê jî tên firotin û eleqeyeke mezin jêre heye.



Çiyayê Şengalê li gel xwezaya xwe ya xweş û bedew, di himbêza xwede gelek berhemên xweş jî digihîne. Demsala havînê dibe çavkaniya berhemên xwezayî û bi tam ji bo hemû welatiyên Şengalê. Her wiha gelek berhemên çandiniyê û fêkiyên Şengalê dikevin bazara Iraqê jî. Yek ji van berhemên nav û deng ku di dengbêjiya Kurdî de, di stran û helbestên Êzidiyan de jî navê wê derbas dibe, hêjîr e. Hêjîr li gelek deverên Şengalê çêdibe, lê Deşta Warê Xidirê ku dikeve nêzî gundê Kersê ya Şengalê yek ji herêma ku herî zêde hêjîr lê çêdibe ye.

Di van salên dawî de li Deşta Warê Xidirê çandiniya darên hêjîran zêde bûye û berhemên wê di bazara Şengal, Mûsil û Herêma Kurdistanê de jî tê firotin.

Nemir Miradê (80) salî, dibêje temenê xwe di ber çandinî û çinîna hêjîran de derbaskiriye. Mirad diyar kir debara wî ya sereke hêjîr bûye û wiha axivî: "60 sale ez bi karê hêjîran re mijûlim. Em niha hêjîran ji hev vediqetînin. Li gel me jêre dibêjin, dikin pêncî. Em yên biçûk û mezin ji hev cûda dikin. Ji vana re jî dibêjin, beşa Gewlaz, Xişxiş û yên navîn. Her yek ji bo tiştek tê bikaranîn. Beşek jî ji bo zivistanê tên hişkkirin."

Cotkarê bi navê Hesen Şeref jî diyar kir ku ew beşeke zêde ya hêjîrên xwe hîn tazene difiroşin û beşa maye jî kom dikin, li ser ban hişk dikin û paşê bi ta an jî darên zirav ve dikin û difiroşin. Şeref dibêje, hêjîrên tên hişkkirin dem dirêj xirap nabin û dikarin bên xwarin.

Hesen Şereş ku bi xwe berhemên xwe diçîne, paşê kom dike û di bazara Mûsilê jî difiroşe û dibêje; "Ji gelek deveran bazirgan jî serdana me dikin, ji bo berhemên me bikirin. Em ji van berhemên xwe gelwaz jî çêdikin."

### Sudoku: Bersiv 15

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 4 | 7 | 5 | 2 | 8 | 1 | 3 | 6 |
| 3 | 2 | 6 | 7 | 1 | 9 | 8 | 4 | 5 |
| 5 | 8 | 1 | 6 | 3 | 4 | 2 | 9 | 7 |
| 7 | 1 | 9 | 8 | 6 | 3 | 4 | 5 | 2 |
| 8 | 6 | 2 | 9 | 4 | 5 | 7 | 1 | 3 |
| 4 | 5 | 3 | 1 | 7 | 2 | 6 | 8 | 9 |
| 1 | 9 | 8 | 2 | 5 | 7 | 3 | 6 | 4 |
| 2 | 3 | 5 | 4 | 8 | 6 | 9 | 7 | 1 |
| 6 | 7 | 4 | 3 | 9 | 1 | 5 | 2 | 8 |

### Sudoku:Pirs 16

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2 | 6 | 5 | | | | | | 7 |
| | | | | 5 | 3 | | | |
| | 9 | 1 | | | 6 | 2 | | |
| | | | 7 | | 9 | | 1 | 6 |
| | 1 | | | | | | 2 | |
| 8 | 7 | | 6 | | 4 | | | |
| | | 8 | 5 | | | 6 | 9 | |
| | | | 8 | 6 | | | | |
| 6 | | | | | | 5 | 3 | 8 |

# FERHENGA BIWÊJAN

**Bi ser serê xwe de bike naqede:**
- Malê wî pir e; pir dewlemend e.

**Ez kodika/beroşa tijî li ya vala nadim:**
- Ez xwe nakim hevalê te; ez di rûyê te de xwe perîşan nakim.
(Dema yekî xizan dixwaze şerê yekî dewlemend bike yê dewlemend wisa dibêje. Ango eger ez şerê te bikim ezê ji te pirtir zererê bibînim. Eger mirov kodika tijî li ya vala bixe, tiştek bi ya vala nayê, lewre tiştek tê de nîne, lê ya tijî wê tiştên tê de birijin)

**Gerew ji garanê tê:**
- Tiştên hêja, tiştên baş ji cihên dewlemend tên; kesê heyî dikare bedelên mezin bide.

**Her didanekî wî meyweyekê dixwe:**
- Bi heman wateyê.

**Ji nanê genim re zikê pola divê:**
- Dewlemendî ne hêsan e, her kes xwe li ber ranagire.

**Malê axê diçe canê xulam diçe:**
- Kesên dewlemend di malê xwe de zererê dibînin, yên xizan ji canê xwe dibin.
- Kesê fêrî bindestiyê bûyî dema tiştek tê serê dewlemendan pir pê diêşe. Malê dewlemendan çeneya feqîran şil dike.
- Dewlemend karê xwe dikin, feqîr û xizan jî li ser malê wan diaxivin.

**Malê Harûn û Qarûn di bin de ye:**
- Pir dewlemend e.

**Patik stûr kiriye:**
- Rewşa wî ya aborî baş bûye; dewlemend bûye.
- Ti kes nizane ka ew mal ji kû daye hev.

**Patika wî stûr e:**
- Bi heman wateyê.

**Patika xwe stûr kiriye:**
- Bi heman wateyê.

**Qura wî germ e:**
- Pereyên wî pir in.

**Silav ne li rihan e silav li mihan e:**
- Qîmetê dewlemendiyê heye, qîmetê rih û temen nîne.

**Wî jî kêlika xwe danî:**
- Ew jî bû xwediyê tiştekî.

**Yê bimal e, bi xaltîk û xal e:**
- Kesê dewlemend be her kes dibêje xizmê min e.

**Zik têr dibe, stirhên xwe li kendalan dide:**
- Kesê dewlemend har dibe.

**LI SER BIHABÛNÊ**

**Agir e:**
- Pir biha ye; nayê kirîn:

**Agirê sor e:**
- Bi heman wateyê.

**Agirê Xwedê ye:**
- Bi heman wateyê.

**Dest dişewitîne:**
- Bi heman wateyê.

**Ma devê te nagere:**
- Ma tu nikarî hinekî din jî bêjî; ji yên ku tu dibêjî pirtir e; pirtir dihêje.

**Li ser min giran bû mal:**
- Li ser min pir biha bû mal; mesrefa min pir lê çû; ez di ber de pir westiyam.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

# 'Pêşengiya civakê bi aboriya Jin pêkan e'





Bi Şoreşa Rojava re, jin weke ku di nava hemû kar û xebatan de cihê xwe girt, di kar û xebata abûrî de jî û di asta pêşengtiyê de cihê xwe girt. Jin bi riya piroje û kopratîfên xwe aboriya civakê pêş xist.**R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1104 | 1-Cotmeh- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# 'TIŞTA KU LI ÎMRALIYÊ TÊ KIRIN POLÎTÎKAYA QIRKIRINÊ YE'



Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Sabrî Ok diyar kir ku hêzên Komploya Navneteweyî pêk anîn û sîstema Îmraliyê ava kirin, hîna di komployê de israr dikin û got, tişta li Îmraliyê tê kirin ne hiqûq e, bi temamî polîkaya qirkirinê ye. Sebrî Ok diyar kir ku hêzên ku Komploya Navneteweyî pêk anîn û sîstema Îmraliyê ava kirin, hîna di komployê de israr dikin û wiha domand: "Li Îmraliyê disîplîn û sîstemek wisa hatiye avakirin ku ti tişt bi serê xwe çênabe. Kom û mejiyek taybet heye li sîstema Îmraliyê bi rê ve dibe. Wezîfeya vê komê ew e ku qirkirina Kurdan li Îmraliyê temam bikin.**R-3**



# Aloziya Başûr û riya çareseriyê

Mamosteyê Zanîngeha Dihokê Kamîran Berwarî diyar kir ku hikumeta heyî ya Başurê Kurdistanê xizmeta gel nekiriye û heger hikumeteke hevgirtî ya teknoqrat were avakirin, çareserkirina pirsgirêkên li gel Bexdayê wê pêkan be. Li ser êrişên dewleta Tirk û hedefgirtina siyasetên medarên Kurd û bi taybet nûnertiya KNK'ê li Hewlêrê got hikumeta Başur ji parastina hemû siyasetmedarên kurd berpirsyar e. Berwarî, di dawiyê de jî got ku çareseriya dozê bi azadiya Rêber Abdulah Ocalan pêk tê.**R-4**

# Wênesazî hunera jiyanê ye



Hunera wênesaziyê yek ji hunerên ku girêdayî çav, mejî û hestên mirov û wênsazan e. Ev huner weke hunerên din li cîhanê tevî bi nav û deng e, li Kurdistanê jî di vê rewşê de ye. Herwiha wênesazên cîhanî û di nav wan de yên kurd jî bi riya vê hunerê derbirîn, xeyal û hestên bedew îfade dikin. Yek ji van wênesazan jî Emîn Ebdo ye.**R-7**

# Li hember guhartina demografîk cîhan bê deng e

Kiryarên dagirkeriya Tirkiyê û siyaseta guhartina damografiya herêmên dagirkirî bi polîtîkeyên herî zirav tên pêk anîn. Li hember vê yekê Rêveberiya Xweser a Kantona Efrîn û Şehba bi daxuyaniyekê siyaseta ku li Efrîn, Bab, Ezaz, Serê kaniyê û Girê Spî tê meşandin red kirin û banga hêzên navnetewî kirin.**R-5**



Qelembazê şoreşa azadiyê
Zozan Cizîrî R-2


Rêwîtiya şervanekî heqîqetê
Idrîs Henan R-5


Misilmanên Kurd tên jehr kirin
Hafiz Ahmet Turhalli R-6

# ‘Pêşengiya civakê bi aboriya Jin pêkane’

**Bi şoreşa Rojava re, jin weke ku di nava hemû kar û xebatan de cihê xwe girt, di kar û xebata abûrî de jî û di asta pêşengtiyê de cihê xwe girt. Jin bi riya piroje û kopratîfên xwe aboriya civakê pêş xist.**

**Ciwana Mûsa /Qamişlo**

Wek ku tê zanîn bi şoreşa Rojava re, rewş bi giştî hat guhertin û bi taybet jî rewşa jinên ku bi hezar salan di bin zilm û zordariya hişmendiya serdest de jiyan dikir û ji gelek mafên xwwe yên bingehîn bê par diman. Lê piştî şoreşa Rojava û avabûna sistema rêveberiya xweser jin bi awayekî azad û wek hev dijî û di hemû warên civakê de cihê xwe digire. Herweha di karê abûrî de jî jin bi rengekî aktîf cihê xwe girtiye û bi 100an pirojeyên serkeftî û kopratîf avakirine û bi awayekî serkeftî xistine bin xizmeta civakê de.

Hediya Elî hevseroka Desteya Aboriya herêma Cezîrê girêdayî jin û abûriyê bi awayekî berfireh ji ronjameya me re axivî.

### Şoreşa Rojava deriyê jiyanê li pêşiya tevahî jinan vekir ye

Hediya Elî hevseroka Desteya Aborî ya herêma Cezîrê derbarê Kar û xebatên jin yên di hundirê Desteya Aborî de, ji destpêka avakirina rêveberiya xweser ve heya roja îro wiha nirxand:” Beriya şoreşa Rojava û li gor sîstema rejîma Sûriyê, ku bi her awayî mafê jinan diçewisandin, û nedhiştin ku jin ji bilî karî malê tu tiştê din bike. Lê bi hatina şoreşa Rojava re rewş bi tevahî hat guhertin û bi taybet jî rewşa jinan, êdî jin bi awayekî hevbeş tevlî hemû qadên civakî, siyasî û aborî bû.” yekemîn car dema ku desteya aborî hat avakirin di çarçoveya felsefeya Netewa Demukratîk û bi perwerdeyên ku hatin dayîn hîn bi rengekî baştir jin di milê rêbazê xebatkirin, çawaniya pêşxistin û birêvebirina kar û xebata ku tê meşandin û bi rengekî aktîf cihê xwe girt. Çawa ku di civakê de cara yekem jin karî van pirojeyan damezrîne, û bi rêve bibe, di vî milî de jî gelek xebat û perwedeyên meslekî û hizrî jî hatin dayîn.

### ‘Bi riya van koperatîfan aboriya civakê tê xurtkirin’

Hediya Elî di berdewamiya axaftinên xwe re wiha got:” Li gor ferq û cudahiya ji sala 2014’an heya 2017’an, û ji 2017 heya 2023’an wek du qonaxan bû, qoaxa damezerandin û qonaxa avakirinê. Qonaxa damezrandinê me bi hin zehmetiyan derbas kir, ji ber ku tu zihniyetekê hildiweşîne û li beramberî wê yeke nû ava dike, lê ew jî bi tekoşîn û berxwedaniya mezin ya Rêveberiya Xweser, di milê diblomasî, siyasî û bi taybet jî di milê civakî de hat meşandin. Ji ber ku zihniyet destpêkê dive di milê civakî de were guhertin, piştre wê jî wê ji hemû milî ve guhertin çêbibin, çawa tu yê vê pirojeyê radestî milet bikî û bi riya koperatîfan aboriya civakî xurt bibe.” Herwiha qonaxa avakirinê ya ku niha em têde ne qonaxa herî girîng e, ku Rêveberiya xweser li ser lingê xwe di milê avakirina pirojeyan de pêşketineke ber bi çav pêkbîne û ev piroje bikevin bin xizmeta civakê de. Di milê rêveberiya xweser de, em dibînin gelek piroje û koperetîfên jinan çêbûne, da ku jin bi vê riyê karibe abûriya xwe ya serbixwe ava bike û pêşbêxe.

### Pirojeyên jinan yê girêdayî kantona Hesekê

-komeleya Werdet alnîsan ya çandiniyê.
-Komeleya Avrîl ya terzî.
-Komeleya fitir, ku 9 jin tê de kardikin.
-Komeleya emel mexrûm. Ji 7 jinan pêk tê.
-Komeleya wadî elehmer. Ku jin ji bo pêwîstiyên rojane kar dikin.
-Komeleya tedamun elkerama.
-Firin cenar. Ji 9 karmendên jin pêk tê.
-Pirojeya terziya nû ya mentîqet alxezel.



### ‘Hazirî ji bo avakirina nexweşxaneyeke taybet bi jinan tê kirin’

Hediya Elî hevseroka Desteya Aborî ya herêma Cezîrê di dawiya axeftina xwe de diyarkir ku, rêveberiya xweser amedekarî ji bona pirojeya avakirina nexweşxaneya welidandinê dike, ku wê di demên pêş de were çêkirin. Ji kar û xebata jin û pirojeyên ku hatine pêşxistin tê xuyakirin ku jin heta çi astê kar û xebatê xwe bi rêxisitn kiriye û karê xwe bi rêk û pêk dike. Di heman demê de xebat ji bo perwerdekirina jinan li ser mekanîzma karê rêvebirina pirojeyan tê meşandin.

# Jin bi keda xwe baweriya civakê qezenc kiriye

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Yek ji pirojeyên Nivîsgeha Jinê ya ku di sala 2014’an de li Tirbespiyê hat pêkanîn; kargiha Rojava ye. Têkildaî vê yekê jî Rêvebirê wê Ebdula da zanîn ku amanca sereke ji pêkanîna pirojeyeke wisa peydakirina derfeta kar ji bo jinên navçeyê.**

Firin û Şêrîngeha Rojava ya li navçeya Tirbespiyê yek ji kargehên ku di sala 2014’an de hatiye vekirin. Ku weke pirojeyeke ji aliyê Nivîsgeha jinê ya Şaredariya gel ya Tirbespiyê û welatiyekî bi navê Mihemed Ebdulla ve hatiye pêkanîn.

### Armanca vekirina firin û şêrîngeha Rojava

Rêveberê Şêrîngeh û firna Rojava, Mihemed Ebdulah, di derbarê armanca vekrina vê kargehê de wiha axivî:”Şêrîngeh û Firna Rojava pirojeyeke ku bi hevkariya Nivîsgeha Jinê ya Şaredariya Tirbespiyê di sala 2014’an de hate vekirin. Armanca sereke ji pêkanîna pirojeyake wisa peydakirina derfeta kar ji bo jinên navçeyê. Herwiha pêşxistina aboriya jinê û hîn bêtir jin bi xwe karibe pirojeyên xwe yên abûrî pêşbêxe. Li aliyekî din jî hebûna kargeheke wisa li Tirbespiyê derfetê kar û xebatê ji bona jinan vedike. Kargehên weke Kargeha Rojava li Tirbespiyê kêmin û şêniyên Tirbespiyê şêranî û hwd ji firoşghên taybet bi buhayekî bilind dikirin. Ji ber vê yekê ev piroje bi alîkariya Nivîsgeha Jinê hat pêkanîn. Destpêka ku ev kargeh hat vekirin gelek jinan cihê xwe têde digirt, lê niha ne weke salên derbasbûyî ye. Îroj dîse jinên ku baweriya wan bi hêz û vîna wan heye, li vê kargehê dixebitin û hînî vî karî dibin”



Mehemed Ebdella

### Awayê kar û berhemên ku li kargehê tên çêkirin

Ebdulah têkildarî kar û berhemên xwe wiha anî ziman:” Kargeha me bi hemû hêz, şiyana xwe her tim hewil dide ku berhemên xweş û paqij çêbike. Me berî niha tenê nanê şêrîn, bêtîfor, beraziq û hwd… çêdikir. Bi piştî wê li gel çêkirina tiştên ku berê me çêdikirin, me dest bi çêkirina hemû cureyên şîranî jî kir. Nimûne weke çêkirina herîsê, kinafê û hwd… Em kel û pelên pêwîst ji Qamişlo bi dolar dikirin û berhemên ku tên çêkirin, bi leyreya Sûrî difiroşin.

Di heman demê de jî buhayê berhemên me ji yên firoşgehên taybet kêmtir e. Em di vê kargehê de ji bilî roja înê, her roj ji seat 5’ê berbangê heya seat 1’ê sibehan kar dikin. Herwiha em bi riya awayê firotina dilîverî jî berhemên xwe li ser asta herêma Cizîrê difiroşin. Di kargehê de 8 kes kar dikin, ji van 3 jin weke karker û firoşkar dixebitin. Karkerek pispor ji bo çêkirina şêranî û tiştên din kar dike û karkerên din jî hem alîkariya wî dikin û hem jî hînî vê pîşeyê dibin. “



Nisrîn Salih

### Astengiyên kar û pirojeyên siberojê

Rêveberê Şêrîngeh û firna Rojava, Mihemed Ebdulah girêdayî astengî û pirojeyên xwe wiha got:”Astengiya ku gelekî bandor li karê me dike bilindbûna nirxê dolar e. Ev yek jî dihêle ku em rastî pirsgirêkan werin. Yek ji van pirsgirêkan kêmbûna asta firotina berheman e. Piştî bilindbûna nirxê dolar di vê dema dawî de şêniyên Tirbespiyê bi sedema rewşa aborî ya zehmet êdî kirîna wan ji berhemê kargehê re kêm bû ye. Wekî din jî alavên me yên ku berhem bi riya wan têne çêkirin kêm in û pêwîstiya me bi hin alavên din heye. Ev hemû astengî bandoreke neyînî li awayê kar dike. Lê tevî van astengiyan jî kar û xebata me bê navber dimeşe. Di heman demê de jî em dixwazin ku vê pirojeyê hîn zêdetir pêşbixin. Di dema niha de em hewil didin ku karê xwe berfireh bikin û pirojeyeke wisa li bajarê Qamişlo jî pêkbînin.

### Pêwîste ku jin tu astengiyan li pêşiya xwe nebîne

Jina kedkar ya bi navê Nisrîn Salih di derbarê karê xwe de wiha axivî:” Ez weke jineke kedkar min cihê xwe di nav karê vê kargehê de girtiye û ev bû 2 sal ku li vir kar dikim. Min destpêkê karê paqijiya vir dikir û ev bû nêzî mehekê ye ku min xwe fêrî çêkirina şêranî, nanê şêrîn û hwd… kiriye. Hatina min a vê kargehê ji ber hezkirin û xwesteka min ya ji bo fêrbûna vê pîşeyê bû. Di heman demê de ji bona ku ez di milê abûrî de rewşa xwe û malbata xwe hîn baştir bikim. Tişta ku hêz û vîna min xurt kir da ku ez kar bikim piştevaniya Rêber Apo ya ji bo jinan e. Ku Rêbertî her tim dixwaze jin li gor xwesteka xwe kar bike û tevbigere, herwiha bindest nemîne. Ez weke jineke kedkar bang li hemû jinan dikim ku tu astengiyan li pşiya xwe nebînin û bi xwe bawerbin û cihê xwe di nava hemû kar û xebatên ji bona avakirin û pêşxistina civakê bigrin.

## Ramangeh

### Qelembazê şoreşa azadiyê

**Zozan Cizîrî**

Wateyek heye di jiyana mirov de, ne bi pereyan tê kirin, ne jî bi qesr û qonaxên şemildar tê guhertin. Mirov ku dibe stêrk û li asîmanê dilê gelê xwe, li bilindiya çiyayan bi dilpakî hebûna xwe bi cih û berçav dike! Wateya Jiyana Nemir, Qelembazê Şoreşa Azadiyê rêheval Seyîd Evran…

Rêheval Seyîd wek rêwiyek dilpak bi pênûs û kameraya xwe ya ronahî dida ser jiyan û têkoşîna gerîlayên Kurdistanê, rastiya şerê li Kurdistanê digihand cîhanê. Di vê rêwîtiya xwe de mil bi milê şervanan, fermandaran meşiya di wan xaçeriyên asê û rengîn ên çiyayên Kurdistanê de. Di şer de peyamnêrekî cengawer, di jiyanê de rêhevalekî dilnizm bû. Bi taybetî ew Lawkê Amedî yê esîl û dilpak rêhevalê azadîxwaz ê jin bû. Jiyana jina têkoşer her bi baldarî dişopand, bi rêzdarî li civatên wan rûdinişt. Jiyana gerîlayên jin wek nepeniya çiya dadiwerivand hundirê xwe. Ji ber azadî di vê meşa jin a li çiyê de veşartî ye. Lewre rêheval Seyîd di nivîseke xwe de bi gotina “Eger rojekê hinek ji min pirs bikin û bêjin kesên riyên herî dirêj ên cîhanê dimeşin kî ne, ez ê bêy dudilî bibêjim gerîla ne. Û ez ê li ser zêde bikim û bibêjim, di destpêka vana de jî gerîlayên Kurdistanê tên. Bi rêwiyên van rêyan re jiyankirin jî, jiyanek cuda ye.” Di vê rêwîtiyê de wekî gelek caran behsa rêhevaltî, dostanî, ken, nêrîn û henekên gerîla dikir, ev dibû çavkaniya jiyan û peyamnêriya Wî. Lewma her ku diket riyekê kenê bedew ê gerîla, nêrandinên wan ên şîrîn li ser dilê xwe dinexişand û bi vê watedariyê ber bi rêwîtiyên nû ve gav diavêt. Rêwîtiya gerîla elbet wek berdewama rêwîtiya bapîrê Wî yê serhildêr a dîrokî nûjen bibû. Xem û hesretên bapîrê xwe yê serhildana wî bi komkujiyê hatibû tepisandin, vê carê hêvî çêbû ku bi pêngavên Şoreşa Azadiyê bigihîne serkeftinê. Û ev Şoreş ne tenê ji bo bajarek an jî parçeyekî Kurdistanê bû, azadiya her çar beşên Kurdistanê dabû ber xwe. Her wisa dilê rêheval Seyîd di her kêliya şoreşê de ji bo her çar beşên Kurdistanê lê dida û tu sînorek ji xwe re nedikir rêgir. Wekî di peyama xwe ya herî dawî de eşkere dike meha Îlonê ya ew xemgîn kirî, em jî ketin nava xemên giran. Xemgîniya wî ya li ser meha Îlonê taybet xemgîniya li ser rêheval Şûkrî (Yasîn Bulut ku 17’ê Îlona 2021’ê li Silêmaniyê bi destê çeteyên MÎT’a Tirk hatibû qetilkirin) bû. Rêheval Seyîd û Şûkrî bi hêvî û bawerî du rêhevalên dildost û dilpak ên vê rêwîtiya azadiyê bûn. Rêheval Şûkrî çawa bihîst nexweşiya dil li hevalê Seyîd der bûye xemek giran xwar û xemeke herî giran a rêheval Seyîd jî xebera şehadeta hevalê Şûkrî bû. Di vê meha Îlonê de herduyan xem û xweziyên xwe kirin yek, wek Stêrkên Geş li nav asîmanê welatê azad xwe bi cih kirin û peyama serkeftinê bilind kirin.

TU NAMIRÎ, TÊ HER BIJÎ QELEMBAZÊ ŞOREŞA AZADIYÊ!



# Wênesazî hunera jiyanê ye

**Hunera wênesaziyê yek ji hunerên ku girêdayî çav, mejî û hestên mirov û wênsazan e. Ev huner weke hunerên din li cîhanê tevî bi nav û deng e, li Kurdistanê jî di vê rewşê de ye. Herwiha wênesazên cîhanî û di nav wan de yên kurd jî bi riya vê hunerê derbirîn, xeyal û hestên bedew îfade dikin. Yek ji van wênesazan jî Emîn Ebdo ye.**

**Reşo Qamişlo/ Qamişlo**

Têkildarî jiyan û hunera wênesaziyê, wênesaz Emîn Ebdo ji rojnameya me re axvî.

### Emîn Ebdo kî ye?

Ez yek ji wênesazê kurd yên Rojavayê Kurdistanê me. Min di sala 1958’an de çavên xwe li taxa Hilêliyê ya bajarê Qamişlo vekiriye û li wir ji dayîk bûme. Min heta refa 12’an li dibistana Qamişlo xwendiye. Piştre jî ez derbasî Şamê bûm û min dest bi xwendina xwe ya zanîngehê kir. Min xwendina fakulteya Hunerên Bedew a Şamê bi pileyekî bilind bi dawî kir û bi asteke serkeftî ji fakulteyê di sala 1985’an de derçûm. Herwiha min ji sala 2002’yan ve heta roja îro li Rojava karê mamostetiya wênesazî û hunerên bedew kiriye. Ji refê çaran ve ez wêneyên balkêş xêz dikim û hîna jî ez di vî karî berdewam dikim.

### Wênesazî ji bo te çi ye?

Wênesazî ne tenê ew hunera ku wênesaz wêneyekî ji bo diyarkirina xweşikbûnê xêz bike. Ev huner ji vê yekê kûrtir e. Hunera Wênesaziyê derbirîna raman û pêre jî diyarkirina xweşikbûna tiştê ku wênesaz lê dinêre û xêz dike. Wênesazî ji bo min hunereke girêdayî bedewiya çav e. Herwiha felsefeyeke kûr û berfireh digre nava xwe. Hunera wênesazyê di serdema me ya nûjen de ne weke ya di serdemên kevnar de ye. Cudabûn qalib û sitîla ku wênesaz bi riya wê tabloyên xwe pê xêz dike. Di serdema kevnar de wênesaz bi dibistaneke bîrdozî ve girêdayî bû û li gorî qalibê wê dibistanê bû. Lê di roja îro de her wênesazek bi tena xwe bûye dibistaneke bîrdozî ya hunera wênesaziyê.

### Te çawa dest bi vê hunerê kir?

Dema ku ez biçûk bûm, gelekî bi xwezayê û xweşikbûna wê ve girêdayî bûm. Di heman demê de ez weke hemû zarokên Rojava min ji çêkirina peykerên ji heriyê yên biçûk pir hez dikir. Ji destpêka ku ez ketim dibstanê de hezkirina min ji wênesaziyê re gelekî diyar bû. Jîngeh û demografiya Mezobotamiya ya ku ez lê mezin bûme ya pir xweşik û balkêş e. Ev yek jî bandorê li derûnî û çavê mirovên vê deverê dike. Xweşkbûn û xwezaya Mezobotamiya jî bandor li derûnî, çav û kesayeta min kir. Lewma van tiştan hişt ku xwestek û vîna min bi aliyê wênesaziyê ve were girêdan. Ez gelek caran beşdarî pêşangehên li ser asta Rojava, Sûriyê, Kurdistanê Ewripa û dewletên erebî bûme. Min yekem car pêşangeheke taybet ji bo tabloyan li bajarê Hesekê di sala 1975’an de li dar xist. Herwiha li ser asta dewletên erebî di sala 1990’î de li Lîbiyayê beşdarî pêşangehekê bûm. Piştî wê jî li ser asta Ewripayê jî di pêşangeha tabloyan a Siwêdê di sala 1991’an de cihê xwe girt. Li Ferensayê jî di sala 1992’an de û li Elemaniya jî di sala 2013’an de, çêbûn û ez tevlî wan jî bûm. Piştre jî li Bakurê Kurdistanê di sala 2015’an de, li Amedê pêşangehek hat lidarxistin û ez tevlî wê jî bûm. Ez ji vê hunerê hez dikim, cudabûna min ji hevalên min ew bû ku hezkirina min jê re hişt ku ez xwe li pêş bixim û bighêjim vê astê. Herwiha asta min a baş di wênesaziyê de bala mamosteyên min dikşand. Lewma min xwe di vî warî de li pêş xist. Ez niha mamosteyê wênesaziyê me û heta roja îro jî ji karê xwe hez dikim û berdewam dikim.

### Tu bi çi şêwazî tabloyên xwe xêz dikî?

Ez wek wênesaz kûrahî û watedayîna tiştan bi şêwazê xwe karê wênesaziyê dikim. Her wênesazek xwedî zanebûn, nêrîn, behre û modêleke taybet e. Ev hemû fakterên bingehîn yên hunera wênesaziyê ne. Herwiha fakterên hemû wênesazan naşibin hev. Ev yek jî dihêle ku şêwazê her wênesazekî ji şêwazê wênesazê din cuda bike. Ji bo xêzkirina tabloyên xwe jî ez rengê ikrîlîk, rengê avî û kerbonî û hwd…xêz dikim. Lê piraniya tabloyên xwe bi rengê ikrîlkî li ser dep, caw û hwd… xêz dikim. Piraniya tabloyên ku ez li ser wan karê wênesaziyê dikim, mezin in. Ji ber ku şêwazê wênesaziya min destanî ye, îcar pêwîstiya vî şêwazî bi tabloyên mezin heye. Min heya niha gelek tabloyên hunerî xêz kirine, piraniya wan jî li ser civaka kurdî ye û hem jî girêdayî xwezaya ku gelê kurd tê de jiyan dike. Ez wek wênesaz li gor afrîneriya xwe dikarim her mijareke ku di ramana min de bigere, bikim tabloyeke hunerî. Lê belê destpêkê wê mijarê di hiş û xeyalê xwe de baş amade dikim. Piştre jî bi şêwaz û afrîneriya xwe karekî hunerî jê çêdikim. Ev nayê wateya ku ez serbest im di vî warî de, lê belê divê tişta ku were xêzkirin li gor civaka ku ez tê de dijîm be. Herwiha dema ku civak li tabloyên min binerin jê fêm bikin û sûdekê jê werbigirin. Ez gelek caran tabloyan xêz dikim, ew tablo jî çîroka destanan vedibêje. Min gelek destanên kurdî bi şêwazê hunerî kirin tabloyên rengîn û xwedî wate.

### Gelo li gor te îroj nêrîna kurdên Rojavayê Kurdistanê li hunera wênesaziyê weke ya berî salên şoreşê ye û niha hunera wênesaziyê li cem wênesazên kurd li Rojava gihaye çi astê?

Hunera wênesaziyê gelekî kevnar e, beriya ku gelê kurd bi awayekî zanistî û birêkûpêk bikar bînin, gelên din li ser asta cîhanî, naskirine. Herwiha wan ev huner bi bisporî bikar aniye. Li cem me kurdan û bi taybet kurdên Rojavayê Kurdistanê beriya Şoreşa 19’ê Tîrmehê, nêrîna civaka me ji vê wênesazî û rewşenbîriyê re ne di wê asta baş de bû . Raste hejmareke baş ji rewşenbîr, hunermend, wêjevanên kurd li Rojava hebûn. Ev kesayetên wisa jî ji bo gelên kurd jî xizmeteke baş kirine. Lê ji bo her karekî ku bikeve xizmeta gelê kurd de di wê serdemê de ji aliyê hikumeta Şamê dihat qedexekirin. Hunermend, wênesaz, nivîskar û hwd çiqasî hewl didan û kar dikin ji bo civaka xwe, lê vê hikumetê derfetê kar û xebatê ne dida. Lewma asta rewşenbîrî û di nav de jî wênesazî li cem wênesazên Rojava lawaz ma. Civaka me jî ewqasî wate nedida hunera wênesaziyê. Bi Şoreşa 19‘ê Tîrmehê re gelek guhertin rûdan û bi taybet jî di karê çand û hunerê de şoreşek pêkhat. Êdî wênesaz xwe di vê hunerê de li pêş xistin û civak jî kete wê ferqê de, herwiha kûrahiya hunera wênesaziya baş nas kir. Ji destpêka ku me li Rojava derfeteke wisa dît, êdî me xwe perwerde kir û çalakiyên girêdayî hunera wênesaziyê pir kirin. Weke li darxistina Pêşangeha Heştemîn ya Hunerên Bedew a li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê çêbû, ku îsal ez jî tê de beşdar bûm. Li aliyekî din jî şagirt waneyên bedewnasiyê di qonaxên perwerdiyê yên seretayî, navîn û amadeyî dibînin. Herwiha kesê/a ku van qonaxan bi dawî dike û heskirina wî/wê ji vê hunerê re were, dikare beşa hunerên bedew di Zanîngeha Rojava de bixwîne. Ez yek ji wan mamosteyên bedewnasiyê yên vê beşê me û xebata min ji bo vekirina vê beşê heye. Ji ber ku asta bedewnasiyê li perwerdeya ku di zanîngehan de tê dayîn ranaweste, pêwîstiya me weke kurdên Rojava bi master û hwd heye. Da ku asta vê hunerê hîn li pêş bikeve divê asta karên bi vî rengî were bilind kirin.





### Ji bilî karê wênesaziyê tu çi karî dike?

Di jiyanê de, dilê mirov bi ser karekî taybet û sereke ve tê girêdan, ji wî karî gelekî hez dike. Kar û jêhatiya min a sereke wênesazî ye. Lê ev nayê wê wateya ku mirov ji kar an jî hunereke din hez neke. Ez ji bilî hunera wênesaziyê ji peykersaziyê jî hez dikim. Min gelek peyker û sembol jî çêkirine ku yek ji van peykeran jî peykerê Şehîd Yûsiv Gulo yê ku li bajarê Qamişlo hatiye danîn. Min ev peyker weke nirxdayînekê ji bo giyanê Şehîd Yûsiv Gulo di sala 2022’an de çêkir. Wekî din jî teşeyê sembolîk yê qada goristina şehîdan a Delîl Saroxan jî yek ji kar û xebata min ya sal 2022’an bû. Di heman demê de jî muzîk giyanê min bi ser xwe de dikişîne û ji lêdana tembûrê jî hez dikim. Dema ku derfet bi min re çêdibe ez wê dema xwe bi lêdana tembûrê derbas dikim. Di heman demê de asteke min a baş di xêzkariyê de heye û bi şêweyekî bedew dinivîsînim. Herwiha min di warê hunera dîkora şanoyê de jî kar kiriye.

# ‘Ramanê Rêber Abdullah Ocalan rêya azadiyê ye’

Endamê PYD`ê û Saziya Malbatê Şehîdan destnîşan kirin ku fikrê Rêber Abdullah Ocalan rêya sereke ya rizgarî û mîsogeriya serkeftinê ye.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Dewleta Tirk ev zêdeyî 25 sala ye ku sûcên dij mirovî û ne qanûnî û tecrîdeke giran li ser Rêber Apo dide meşandin. Li hemberî tecrîda giran a ku li ser Rêber Apo tê meşandin heyanî neha tu saziyên navnetewî û di serî de jî CPT ji bona vê rewşê neketine di nava liv û tevgerê de.
Di derbarê tecrîda giran a ku li ser Rêber Apo tê meşandin, endamê Partiya Yekîtiya Demokratîk Faris xelo û endama Saziya Malbatê Şehîdan Xaliya Silêman ji rojnemeya me re axivîn.
Faris xelo da xuyakirin ku Tişta ji hêla dewleta Tirk ve tê kirin, di derbarê zagona navnetewî de binpêkirinên ber bi çavên û wiha got:”Tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan tê meşandin, dikeve warê îşkenceya derûnî ya ku li gorî zagona cîhanî hatiye dest girtin”. Tecrîda girankirî ya li ser Rêber Abdûllah Ocalan ku di demên dawî de bi cezayên displînê yên dewleta Tirk li ser Rêbertî dimeşîne, nîşaneya wê yekê ye ku jiyana Rêbertî di metirsiyê de ye. Herwiha dewleta Tirk, bi her awayî dixwaze dawî li jiyana Rêber Abdullah Ocalan bîne û di cîhanê de ev cezayên ku li ser Rêber Abdullah Ocalan Tê meşandin, li ser tu kesî nehatiya meşandin.”

**‘Her ku diçe tecrîdê girantir dikin’**

Faris di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku ji bo tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan were şikandin, divê tevahyî gelê Kurd bikevin nava çalakiyan de û wiha got: “Ev zêdeyî 25 salane ku Rêber Apo li girtîgeha Îmraliyê deye û ceza li ser ceza li ser wî tê birîn. Wek gelê Kurd em dibêjin her kesî bila dengê xwe bilind bikin, li Rêber Apo xwedî derbikevin ji bo ku em vê tecrîdê bişkînin. Çiqas gelê Kurd dengê xwe bilind bike, dewleta Tirk a faşîst ewqas tecrîdê giran dike. Ji ber wê jî her Kurdekî ku dilê wî/ê ji bo azadiyê, ji bo Rêber Apo, Şehîd û şervanên azadiyê lêdide, divê tecrîdê qebûl nekin û ji bona azadiya Rêbertî ya fîzîkî şev û roj di nava kar û xebatê de bin. Divê em hemû di nava çalakiyan de bin, em bi awayê herî xurt xwedî li Rêber Apo derbikevin. Ji her çar aliyên welat bigre heta dervey welat, Ewrupa û hemu cîhanê, ji bo em tecrîd û stûna zilmê ya Erdoganê faşîst bişkînin. Ji ber ku ramanê Rêber Abdullah Ocalan rêya rizgarî û serketinê ye.”

**‘Bi fikir û felsefeya Rêber Apo em ê azadiya wî a fîzîkî Pêkbînin’**

Endamê Partiya Yekîtiya Demokratîk Faris Xelo da zanîn ku tevahî tevgerên rizgariyê û gelên ku hewl didin civakeke demokratîk ava bikin, dizanin ku fikirên Rêber Apo wê guhertineke mezin pêk bîne û wiha dawî li axaftina xwe anî:” Dewleta Tirk a dagirker ji bo gelê kurd jiyaneke azad û demokiratîk jiyan nekin,hemû cureyên şer li ser gelê kurd dide meşandin. Herwiha di kêleka vî şerî de jî tecrîdê li ser Rêber Abdullah Ocalan girantir dike, armanca vê yekê jî şikandina îradeya gelê kurd e.
Lê wê dewleta Tirk a faşîst negihêje armanca xwe ji ber ku em bi fikir û felsefeya Rêber Apo ve girêdayî ne û em ê heyanî azadiya Rêber Apo a fîzîkî Pêk were di nava tekoşînê de bin.”



Faris Xelo



Xaliya Silêman

**‘Doza Rêber Apo dozeke mirovî ey’**

Di heman çarçoveyê de xuşka şehîd Enwer Silêman, Xaliya Silêman da zanîn ku êrişên giran ên dewleta Tirk yên li ser gelê kurd û gelên herêmê û pêre jî tecrîda li ser Rêber Apo armanca wê şikandina vîna gelê Kurd e. Dewleta Tirk a dagirker bi zanebûn tecrîdê giran dike, da ku ji hemû milî ve Rêber Apo û gel ji hev qut bike. Doza Rêber Apo dozeke mirovî ya mezin e. Ji mafên her girtiyekî ye ku têkilî bi parêzer û malbata xwe re deyne, lê ev 31 mehin ku hevdîtin bi Rêber Abdullah Ocalan re ne hatiya çêkirin. Ev jî sûcekî herî mezin e, pêwîste dewletên navnetewî, saziyên parastina mafê mirovan û CPt li hemberî tecrîda giran a li ser Rêber Apo tê meşandin rawestin.”

**‘Saziyên navnetewî di derbarê tecrîdê de tu gav navêjin’**

Xaliya di dawiya axaftina xwe de destnîşan kir ku Tişta Dewleta Tirk di şexsê Rêber Apo de dide meşandin raste rast gelê Kurd armanc digre û wiha got: “Em gelê Kurd ji bo parastina Rêber Abdullah Ocalan û însiyatîfa azadiya Rêber Abdullah Ocalan a Sûriyeyê bi tundî van nêzîkatiyên dij mirovî û dij zagonî yên dewleta Tirk şermezar dikin û gomanên xwe yên girêdayî jiyan û çarenûsa Rêber Apo nîşan didin. Ji ber wê heyanî ku azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêk were em ê têkoşîna xwe ya hiqûqî, qanûnî û siyasî berdewam bikin. Herweha em bang li civaka Navnetewî bi hemû saziyên wê yên mafê mirovan dikin ku ji ber sûcên ku dewleta Tirk dike di dadgehên navnetewî de were dadgehkirin.



## Misilmanên Kurd tên jehr kirin

Hafiz Ahmet Turhalli

Bîr û bawerî di jiyana Mirovan de û di dîroka mirovahiyê de cîhekî girîng digre. Em karin bêjin dîroka xwenasîna mirovahiyê û ya bîr û baweriyê bi hev re hatiye berdewam kirin.
Zîhniyet û jiyana mirovan seranser di bin bandora, bîr û baweriyê de hatiye hûnandin.
Jiyan, bîr û bawerî bi hev ve wek laş û ruh girêdayiye. Jiyanek dijî bîr û baweriyê jiyanekî kême ne temame, baweriya dijî jiyanêjî ne baweriyekî rast û cîhdeye.
Ji ber Afirîner Xwedêye! Xwedê ji bo jiyanekî baş bi edalet û wekhev di nava mirovande cî bi cîh bibe, Pêxemperan erkdar dike û Olan dişîyne. Dema Ol dijî jiyana mirovan be, ev di rastiyêde dibe nakokiyek kûr.
Tevgera ku bi navê Ol were vegotin, divê jiyana mirovan pîroz bidêre û ji bo jiyanek bi rumet û aram têbikoşe. Di Sureya Tîn de Xwedê weha dibêje: “Bê guman me mirov bi xweştirîn cureyî afirand. Piştre me ew daxist jêrê jêran”. (Tîn 4-5)
Em dema desthelatên derdora xwe dişopînin ku ji xwer dibêjin em Misilmanin û tiştên ji biryar û kiryarên wan pêk tên, zêdetirî wan kiryaran dij mirovahiyê ne. Ev dijberiya Jiyan û mirovahiyê, di bin navê Olan de meşandin, di rastiya xwe de dijberiya Xweda û Pêxemberane.
Desthilatên ku îro li cîhanê kar dikin û bi navê Ola Îslamê desthilatê dimeşînin, seranser dijberiya jiyana Mirovan dikin. Ola kû ew teblîx û propagandaya wê dikin, dijî jiyana mirovan e. Mafê can, mal, rumet, bawerî, nesil û bîrdozî yekcarî di pergala wan de nayê xuya kirin.
Wek mînak: Herî zêde Xwîna mirovan bê sedem, li Îran, Tirkiyê, Iraqê, Suriyê û Afganîstanê tê rijandin. Mal, nesil, rumet û baweriya mirovan herî zêde di van welatan de, tê tune kirin.
Em dikarin bi hesanî bêjin; nirxên mirovahiyê di van welatan de têne tune kirin. Ev tune kirin jî, bi navê Ola Îslamê tê pêkanîn.
Ola kû, ji bo desthilatdaran, dizîyê, kuştinê, dest danîna ser milkê gel, faîzê, derewan, îftîrayan, madeyên hişbir, talan û tecawûza jinan û bê rawiştiyê rewa dibîne, gelo ev kîjan Ole? Ger ev kiryarên qirêj û kirêt di nava civakan de werin normalîze kirin, wê rewşa van civakan çawabe? Ev rewş îro bi navê Ol, di nav civakan de hatiye bi cîh kirin. Bingeha wê jî, weha tê amede kirin. Jehra dijî jiyanê û Ola rast, bi çêkirin û pêşxistina Olekî sexte tê têkbirin.
Wek em hemû temaşe dikin, dewleta Tirk ev bi dehan salan e bi navê Ola Îslamê Ola senteza Îslama Tirk, wek jehrekî di nava gelê me de belav dike. Neha jî Hîzbul qontra zarokên me kumukan dide serê wan, li Batman û Amedê de, di bin navê heskirina Nimêjê de, li qadan dide meşandin û pê sloganên Tirkî dide avêtin.
Divê em Ola rast ya Îslamê xwedî derkevin û dijî van mar û dupişkan hişyar tevbigerin.
Divê em nehêlin Îslama civakî, demokratîk û îlmî were têk birin û jehra neteweperestên Tirk, Ereb û Farisan di nava gelê meyê Misilman de were belav kirin.
Ev karên bidestên van xayinên Îslamê dikevin jiyanê de, divê were seknandin û pêşî lê were girtin. Li ser her Oldarekî Kurd ferze kû pêşî li van jehran bigre û nehêle gelê me, zarokên me werin jehrî kirin.

# Werzîşa herêma Cizîrê

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

**Ji bo pêşxistina werzîşê li herêma Cizîrê, di sala 2014`an de Desteya Ciwanan û Werzîşê hat damezrandin û di sala 2023’an de navê wê veguherî Meclisa Werezîşê ya herêma Cizîrê. Di salê derbasbûyî de, werzîş li herêma Cizîrê heta asteke berbiçav pêşket.**

Ji bo rêxistinkirin û pêşxistina asta werzîşê, di sala 2015`an de Yekîtiya Ciwanan û Werzîşê li herêma Cizîrê hat avakirin. Di 8’ê Nîsana 2015’an de Yekîtiya Ciwanan û Werzîşê dest bi pêngava destûrdayîna yanan kir, herwiha yekem yane ku destûrdayîn wergirt, yana Ciwanên Amûdê bû. Di heman salê de hejmara yanên ku destûrdayîn wergirtin gihişt 4 yanan. Ew jî ya Cûdî, Rojava, Cizêrê û Eltîhad. Lê di sala 2023’an de navê Yekîtiya Ciwanan û Werzîşê hat guhertin û bû Meclisa Werzîşê li herêma Cizîrê.

**15`e yane beşdarî şampiyona goka lingan ya mêran dibin**

Di sala 2020`an de hijmara yaneyan gihaştibû 25’an, lê di sala 2023`an de hejmara wan vegeriya 15`e yaneyan, ew jî ev in; Qendîl, Asayîş, Berxwedan li bajarê Qamişlo, Elsinadîd li Til koçer, Cûdî li Rimêlan, Alîyan li Girkê Legê, Waşokanî bajarê serê kaniyê ku ji aliyê dewleta tirk hatiye dagirkirin cihekî taybet bi yaneyan tineye, Ciwanên Baz, Aşîtî, Elitîhad, Elixiwee li Amûdê, Xebat li Dirbêsiyê, Ciwanên Hesekê û Serdem li Hesekê. Ev yaneyên ku beşdarî şampiyona goka lingan mêran dibin.

**Werzîşa Jinan**

Li ser asta herêma Cizîrê avakirina tîmên jinan ji sala 2016`an ve hat destpêkirin. Yaneyên taybet bi lîstokên jinan jî evin; Peyman, Vedeng û Ehlê Amûdê. Herwiha lîstokên jinan ku şampiyona wan li herêma Cizîrê tên lidarxistin jî ev in;karatê, Taykwando, Kîk boksîng, Volleyball, Basketbol, Goga Lingan, hêza laşî, Hêza Fîzîkî, Tênsa masê, Şetrenc, Avjenî.
Sitadyom bi giştî li Til Koçer, Rimêlan, Şiheda Dirbasiye, Şermola li Amûdê, Şihedaa Hesekê, Til Xenzîr. Herwiha Sitadyomên mezin yên giya; Şehîd Heysem Kiço li Qamişlo, Şehîdên 12`ê Adarê li Qamişlo û Fakolteya Wêjeyê li Hesekê.
-Salonên ku niha di xizmetê de ne; Rimêlan, Tirbispiyê û Amûdê.
-Yaneyên Futbolê yên Jinan;Peyman – Asayîş, Vedeng, Waşokanî û Ehlî Amûdê.
-Yaneyên basketbolê yên jinan; Asayîş û Barxwedan.
-Yaneyên voleybolê yên jinan; Sardem, Aşîtî, El Itihad, El Exiwe, Ciwanên Baz û Cûdî.
-Şetrancê Jinan;Yaneya Berxwedan û Asayîşê.
-Yaneyên tenîsa maseya yên jinan; Serdem, Berxwadan, Ehlî Amûdê, El Itihad û Qendîl.
-Badmîntona jinan; Ehlî Amûdê.
-Tîmek Bidî Biskilêt ku taybet bi jina ye.
-Taykwando ya Jinan; Tîma Roj, Dêrik û Daydo.
-Lîstekên jin û mêr bi hev re; Yaneya Elsinadîd, Asayîş, Serdem, El Itîhad û Berxwedan, Navend Avan, Gold Cêm û Hesekê.
Yaneyên basketbolê; Asayîş, Berxwedan, Serdem, Qendîl û Xebat.
Yaneyên Voleybolê; Asayîş, Cûdî, ElSenadîd, El Exiwe, Alîyan, Serdam, Ciwanên Hesekê, Elitîhad, Ciwan Baz û Aştî.
Kîk boksîng; Yaneya Vedeng, Qendîl, Asayîş, Navenda çiya û dibistana Daydo.
YaneyaBadmîntona ; Serdam, Biratî û Aştî, Xebat, El Itîhad, Cûdî û Ciwanên Baz.
Avakirina Gewde; Yaneya El Itîhad, Asayîş û Ciwanên Hesekê.
Yane Tenîsa Maseyê; Xebat, Cûdî, Berxwdan, El itîhad, Qendîl, Serdam, El Exiwe, Ciwanên Baz.
Li Bajarên ku Hêza Bedenî lê tên lîstin; Hesekê, Til Temir, Dêrik, Girkê Legê û Qamişlo.
Yaneya Şetrancê; Serê Kaniyê, Xebat, Qendîl, Serdam, Asayîş û Berxwedan.
Taykwanda Mêran; Akademiya Pispor, Navenda Salar, Navenda Dêrikê, Navenda Amûdê, Navenda Şîariz, Navenda El Mûelim, Navenda Serê Kaniyê, Navenda Stêrkên Hesekê, Navenda Daydo.



# ‘Sûcên li dijî Abdullah Ocalan durûtiya hêzên navneteweyî nîşan dide’

Lêkolîner û aktîvîstên misirî siyaseta bêdengiyê ya hêzên navneteweyî ya li hember sûcên dewleta Tirk ên li dijî Rêber Abdullah Ocalan şermezar kir û got sûcên li dijî Rêber Abdullah Ocalan durûtiya hêzên navneteweyî nîşan didin.

**Navenda nûçeyan**


Sûcên desthilata dewleta Tirk a dagirker ên li dijî Rêber Abdullah Ocalan li gel bêdengiya hêz û civata navneteweyî û rêxistinên wê, dewam dikin.
Lêkolînerê kar û barên herêmî û navneteweyî yê ji Misirê Hanî El Cemel li ser mijarê got: “Li cîhanê guhertineke siyasî çêdibe. Dê bi xwe re gelek guhertinên siyasî û stratejîk bîne, çi li ser asta cîhanî yan jî herêmî yan jî neteweyî. Li gel van guhertinan jî, dîlgirtina Abdullah Ocalan lekeyeke reş li kirasê azadiyê yê spî ye. Azadiya qaşo gelek rêxistinên mirovî yên navneteweyî û herêmî banga wê dikin û dema hin alîgirên pergalên siyasî yên mezin bên rexnekirin an jî azadiya wan sînordar bibin, bi hêrs û aciz dibin. Berovajî, rewşa rêberê dîrokî yê gelê Kurd Abdullah Ocalan ê di nava tecrîdeke giran de ye, ne tenê ji aliyê bedenî ve, lê belê di aliyê fikrî de ye jî.”
El Cemel diyar kir ku gelek dewletan komplo li dijî Rêber Abdullah Ocalan li dar xist, ji ber ku bi baweriya wan, dîlgirtina wî ji wan re bi sûd bû û got: “Ew dibînin ku fikrên wî li ser wan xetere û li pêş ferzkirina siyasetên wan ên kapîtalîst û zordest astengî ne.”
Li gor El Cemel tevî îşkenceyên derûnî û bedenî yên li dijî Rêber Abdullah Ocalan, astengkirina hevdîtinên bi malbat û parêzeran re û nehiştina rêxistinên tenduristiyê serdana wî bikin, tevî wê jî fikrên wî ne tenê li Rojhilata Navîn lê li seranserê cîhanê belav bûn.
El Cemel got armanca sûcên li dijî Rêber Abdullah Ocalan ew e ku gelên bindest wî û fikrên wî yên azadî û demokrasiyê nas nekin. El Cemel anî ziman ku fikrên Rêber Abdullah Ocalan di misogerkirina ewlehiyê li herêmên dagirkirî de tecrubeyeke yekane ye, ew jî bû sedem ku dewleta Tirk şerê projeya neteweya demokratîk bike.



Hanî El Cemel

**Tirsa ji Rêber Abdullah Ocalan**

Li ser bêdengiya navneteweyî ya li hember sûcên li dijî Rêber Abdullah Ocalan jî El Cemel got: “Destê gelek dewletên Ewropayê û Amerîkayê di kompoloyê de heye. Ji ber ku li hember sûcên li dijî wî tên kirin, bêdeng in. Ji ber ku Rêber Abdullah Ocaaln şerê pergalên kapîtalîst û zordest dike. Her tim parastina gelên bindest û mezlûm dike. Ev jî pergalên kapîtalîst nerihet dihêle. Bêdengiya wê jî li hember tecrîda girankirî ji ber vê sedemê ye. Ruxmî ku îdiaya parastina mafên mirovan dike jî lê ji dema dîlgirtina Rêber Abdullah Ocalan ve, bêdeng e. Rêxistinên hiqûqî erkên xwe naynin cih û di salên şer de tiştek ji gelê Kurd re pêşkêş nekirin. Ji ber ku rêxistinên hiqûqî û mirovî di bin bandora siyasetê de ne û girêdayî dewletên komploger in.”
Têkildarî metirsiyên van dewletan ji serbestberdana Rêber Abdullah Ocalan, El Cemel wiha axivî: “Ew bi fikarin û hesabê ji derketina Rêber Ocalan ji girtîgehê re dikin. Ji ber ku projeya wî ji bo gelek pirsgirêkên girêk li Rojhilata Navîn, çareserî ye. Kompoloya navneteweyî ya li dijî wî, ji bo kontrolkirina karîgeriyên gelên azadîxwazin, li dar ket. Ji ber wê divê, gel xwedî li firkê Rêber Abdullah Ocalan derkevin û hewl bidin ku ew ji girtîgehê derkeve, pişta xwe nedin civata navneteweyî û mirovî. Lê belê xwe bispêrin gelên azadîxwaz, rêxistinên civaka sivîl û bibin yek ta ku Rêber Abdullah Ocalan û gelek têkoşerên azadiyê serbest bên berdan.”



Osama Şemis

**‘Durûtiya civata navneteweyî’**

Gerînendeyê Meclisa Mafên Mirovan a Misirî-Erebî Osama Şemis jî got: “Sûcên ku dewleta Tirk a dagirker li dijî Rêber Abdullah Ocalan pêk têne, binpêkirina mafên mirovan e. Gelo çawa mêrek 70 î sal derbas kiriye, di hucreya takakesî de tê girtin û hevdîtinên bi malbat û parêzeran re lê tê qedexekirin.”
Şemis aşkera kir ku dosyaya Tirkiyeyê ya mafên mirovan tijî binpêkirin û sûcên li dijî muxalefetê û aktîvîstan e. Şemis bêdengiya civata navneteweyî ya li hember kiryarên pergala Erdogan şermezar kir û got: “Em dikarin bêjin, ji ber berjewendiyên hevbeş li gel pergala Tirk û dewletên mezin, ew bêdeng in. Ji ber ku sûdê ji dûrxistina Abdullah Ocalan digirin.”
Osama Şemis got sûcên li dijî Rêber Abdullah Ocalan, derew û durûtiya hêzên mezin naxwazin aştî û aramî li herêmê pêk were mîna ku îdia dike, lê belê dixwaze fitne û nakokî di nava gelê herêmê de belav bin.
Şemis bal kişand ser rola hêzên rojavayî di aloziyên li herêmê de û got: “Rojava, li paş şerê li Sûdanê û talankirina berhemên binerd û sererd ên Afrîkayê ye. Ew piştgiriya komên çekdar li Rojhilata Navîn dike ji ber wê nahêle fikrên Abdullah Ocalan ên aştîxwaz, biratî û jiyana hevbeş di nava pêkhateyan de belav bibe. Nemaze ku li ser stratejiya wan a kontrolkirina herêmê xetere. Yanî ez bawer nakim ku civata navneteweyî




civata navneteweyî aşkera dikin ku li şûna tevahî tev bigerin û wî serbest berdin û ji ber felsefe û fikên wî yên banga aştî û hevgirtinê di navbera pêkhateyên Rojhilata Navîn dike, xelat bikin, çavê xwe li hember sûcên li dijî wî tên kirin digirin.
Bi nêrîna Şemis ev bêdengî, nîşaneya erêkirineke veşartî ye ji bo pêkanîna sûcan li dijî wî, ev jî îsbat dike ku yan jî rêxistinên hiqûqî yên cîhanê li hember doza Abdullah Ocalan helwesteke erênî nîşan bidin.”
Şemis di dawiyê de got: “Rêya azadkirina Abdullah Ocalan bi belavkirina fikrên wî, rojevkirina doza wî li dezgehên çapemeniyê, lidarxistina semîneran têkildarî parêznameyên wî û lidarxistina çalakiyan û aşkerakirina sûcên li dijî wê, dest pê dike.”

# Sebrî Ok: Tişta ku li Îmraliyê Tê kirin polîtîkaya qirkirinê ye

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**Endamê Konseya Rêveber a KCK’ê Sabrî Ok diyar kir ku hêzên Komploya Navneteweyî pêk anîn û sîstema Îmraliyê ava kirin, hîna di komployê de israr dikin û got, tişta li Îmraliyê tê kirin ne hiqûq e, bi temamî polîkaya qirkirinê ye**

Endamê Konseya Rêveber a Koma Civakên Kurdistanê (KCK) Sabrî Ok ji ajansa ANF’ê re axivî.
Sebrî Ok diyar kir ku hêzên ku Kompoloya Navneteweyî pêk anîn û sîstema Îmraliyê ava kirin, hîna di kompoloyê de israr dikin û wiha domand: “Li Îmraliyê disîplîn û sîstemek wisa hatiye avakirin ku ti tişt bi serê xwe çênabe. Kom û mejiyek taybet heye li sîstema Îmraliyê bi rê ve dibe. Wezîfeya vê komê ew e ku qirkirina Kurdan li Îmraliyê temam bikin. Di vî warî de tişta li Îmraliyê tê kirin ne hiqûq e, bi temamî polîkaya qirkirinê ye. Ji xwe armanca avakirina sîstema Îmraliyê jî ev e. Yan ti şîroveke din a vê tune ye ku Rêber Apo nêzî 3 sal in nikare bi malbat û parêzerên xwe re hevdîtinê bike. Bi ‘sûcê dîsîplînê’ henekê xwe bi nirx û psîkolojiya gelê Kurd, bi hiqûq, demokrasî û mafên mirovan dikin. Mirovek ku tenê li girav û hucreyekê de bê girtin, dê çawa sûcê dîsîplînê bike. Mirovek ku jê re hatiye qedexekirin ku name binivîse û têkîliyê bi derve re çêke û nikare bi malbat û parêzerên xwe re hevdîtinê bike, wê çawa sûcekî dîsîplînê bike.”
Sebrî Ok wiha dewam kir: “Li Îmraliyê pêkanînek pir alî, xwedî gelek rêbaz û pir derexlaqî heye; têkoşînek dijwar didome. Têkoşîn îdeolojîk e, derûnî ye, îradeyî ye û polîtîk e. Eger mirov hîn zelaltir diyar bike, dewleta Tirk a qirker li dijî gelê Kurd û Tevgera Azadiyê polîtîkayek e hilweşandinê pêk tîne. Xwest destpêkê vê yekê li Îmraliyê bi ser bixe, lê nekarî. Rêber Apo tevî hemû zextên giran, li ber xwe da û polîtîkaya hilweşandinê pûç kir. Hêrsa mezin a dewleta Tirk a qirker ji vê yekê ye. Her wiha divê bê zanîn ku dewleta Tirk dewleteke bi gir û nefret e. Lê Rêber Apo êdî ne kesek e; bi milyonan kes e, jin û ciwanên



berxwedêr e, gelên Rojhilata Navîn e, dengê hemû mirovahiya têkoşer e.”
Sebrî Ok derbarê xiyaneta PDK’ê ya li dijî hebûna gelê Kurd wiha got: “Em li dijî dewleta Tirk a qirker li her derê tê dikoşin. Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî ji aliyê dewleta Tirk a qirker ve hatine dagirkirin. Bi dehan baregehên leşkerî yên artêşa Tirk li Başûrê Kurdistanê hene. Bi balafirên biçek ên bimirov û bêmirov û yên şer her roj Başûr û Rojavayê Kurdistanê tên bombekirin. Xwezaya Kurdistanê û mirov tên qetilkirin. Li dijî hêzeke wiha ya qirker çi tevgereke bi navê Kurd hebe diyar e ku divê bi helwesteke çawa rabibe. Helwesta PDK’ê, bipêşvebirina têkiliyan bi dewleta Tirk a qirker re ye. Nexwe wê dewleta Tirk a dagirker, qirker ji ber sûcên ku li Efrînê kirine-dike wê teqez li dadgehên navteweyî bi sûcê şer bê darizandin. Lê ji ber helwesta hin komên xwedêgiravî Kurd ên bi PDK’ê re ku dagirkerî û qirkerî li Efrînê rewa dikin, dike ku ev zor bibe. Li Başûrê Kurdistanê jî rewş heman e. Ne ji ber helwesta PDK’ê bûye heta bi niha wê artêşa Tirk a qirker wê teqez li ber gerîla têk biçûya. Ya dihêle dijmin bêhna xwe bistîne, PDK ye.”
Endamê Konseya Rêveber a Koma Civakên Kurdistanê (KCK) Sabrî Ok da xuyakirin ku ew ê têkoşîna xwe di hemû waran de ji bo parastina destkeftiyên Kurdan geş bikin û wiha got: “
Bi qasê Kurdan tu gel bi gel û erdnîgarî parçe û dabeş nebûye. Ji wê boneyê Kurd ji her kesî bêhtir hewceyê yekitiya neteweyî ne. Ji berê ve ji vê polîtîkaya li ser Kurdistanê re ‘parçe û dabeş bike û bi rê ve bibe’ hatiye gotin. Ev polîtîka berdewam e. Bi tenê Kurd ku herî pir parçe û dabeş bûne, dûrê vê yekitiyê ne. Yekitiya neteweyî pir pêwist e. Nexwe ji bo çêbûna xerca yekitiya neteweyî bi kes û kom û partiyan re ku li ser xeta welatparêziyê bên hev, avêtina gavên pêwist li ser vî esasî ya herî rast û pêkan e. Em partî di vî warî de her tim bi fedakarî û perspektîfa herî berefeh tev geriyane. Ji niha û pê ve jî wê sekina me ya li ser esasê yekitiya neteweyî ya berdewam be. Em ê têkoşîna xwe di hemû waran de ji bo parastina destkeftiyên Kurdan geş bikin.”

# Kamîran Berwarî: Aloziya Başûr û riya çareseriyê

**Elî Roj**

Mamosteyê Zanîngeha Dihokê Kamîran Berwarî diyar kir ku hikumeta heyî ya Başurê Kurdistanê xizmeta gel nekiriye û heger hikumeteke hevgirtî ya teknoqrat were avakirin, çareserkirina pirsgirêkên li gel Bexdayê wê pêkan be. Li ser êrişên dewleta Tirk û hedefgirtina siyasetên medarên Kurd û bi taybet nûnertiya KNK'ê li Hewlêrê got hikumeta Başur ji parastina hemû siyasetmedarên kurd berpirsyar e. Berwarî, di dawiyê de jî got ku çareseriya dozê bi azadiya Rêber Abdulah Ocalan pêk tê.
Berwarî derbarê aloziya di navbera hikumeta Başurê Kurdistanê û hikumeta Bexdayê, herwiha êrişên dewleta Tirk li ser Başurê Kurdistanê û hin mijarên din ên girêdayî parastina destkeftiyên gelê kurd, pirsên rojnameya me bersivandin.
Hevpeyvîn wiha ye:



**1-Girêdayî rewşa dawî li başurê kurdistanê û bi taybet jî êrişên dagirkerên tirk li ser başurê kurdistanê û heremên berxwedanê yên gêrîle û hevkariya PDK'ê ya raste rast û işkere bi dagirkeriya tirk re, hûn vê yekê çawe dinirxînin û ger rewş wisa dewam bike wê rewşa heyî berû kûve biçe.**

Di sala 1983'an ve û heta niha aloziya di navbera Başur û Bakur de berdewame û di sala 1992'an û 1995'an de derket asta herî jor. Ji wê demê ve hevkariya di navbera Başur û dewleta Tirk de berdewame, ew jî derbeke mezin li dijî destkeftiyên tevahî Kurdistanê ye.
Hêza ku di 13'ê meha 9'an de ew hêzên çûne li herêma Sîdeka, tu têkiliya wê bi Artêşa IRaqê re nîne. Li wir lêdaneke yekser di navbera pêşmerge û Gêrîla de çêbike. Dewleta Tirk ji mêj ve hewl dide şerekî di navbera pêşmegre û Gêrîla de derbêxe. Ew pirojeya dewleta Tirk serneket. Ji lewma niha hewl didin bi riya Tirkiyê, Iraq û Îranê wê nexşeya xwe pêk bînin şerê kurdan derbixin. Nexşeya sedsala derbasbiwî bi dawî bû, niha dixwazin nexşeya sedsala 21'an derbixin, Ew dizanin dema kurd di yek sengerê de bin ew nikarin li dijî hêza kurd şer bikin. Me dît li Kobanê, Kerkûk û Şengalê dema gelê kurd bi yek destî li dijî êrişkaran şer kirin. Hêzên cîhanî û herêmê jî wê demê neçar dimînin hevkariyê bikin. Ji ber wê îro ji kurdan tê xwestin yekîtiya xwe pêk bînin.

**2-Di sala 2017an de li başurê kurdistanê refirandom hate çêkirin û di encama vê siyaseta şaş de gelek herêm ji dest kurdan hatin derxistin, rewşa di van rojên dawiyê li kerkûkê tê jiyankirin heman rewşê tîne bîra mirov, hûn vê yekê çawe dinirxînin.**

Rewşa di sala 2017'an û 2023'yan de heta radeyekê wekî hev in, Gelek tiştên hevbeş di nav herdû planan de hebûn. Ji ber gelek hêzên herêmê destê xwe avêtine wê. Rêveberiya Başurê Kurdistanê di sala 2017'an de şaştiyek mezin kir û refirandom pêk anî û di encamê de 32 ji xaka Kurdistanê ji dest da.
Ji Kerkûkê heta Dêrazorê hêzên herêmî û navdewletî destê xwe tê de hene, di hemû planan de jî armanca wan ew e ku gelê kurd xaka xwe ji dest bide. Ew dixwazin dijminên Kurdistanê destê xwe deynin ser wê axê.

3- Li gorî ku tê xuyakirin ku PDK'ê dixwaze bi hevkariya tirkiyê tevahiya başurê kuristanê têxe di bin serwereiya xwe de. Li hemberî vê yekê di serî de erkên ku dikeve ser milê YNK'ê û partiyên din çiey.

Di van deman de erkên dikeve ser milê YNK'ê û partiyên din ên Kurdistanê ew ji aliyekî ve di navbera PDK'ê û PKK'ê û KCK'ê de çûn û hatinê vebikin û gotûbêjên di navbera wan de çê bikin. Ji milekî din ve jî hemû alî li dijî aliyê ku dibe sersebebê şer û pevçûnên di nava kurdan biseknin. YNK'ê li Rojava, Şengal, Kerkûkê û herêmê din dikare roleke erênî bilîze, ji ber heta astekê baş kadroyên wan û xebatkarên wan hene û cemawerên girêdayî wan li her derê hene. Ew bi partiyên din ên Kurdistanê re dikarin PDK'ê nçarî danûstendinan bikin û bihêlin bi aliyê dîplomasî û siyaseta netewî ve gavan bavêjin.

**4-Ji bona hevrêziya kurdî pêkwere heyanî neha çi hatiye kirin û pêwîste ku çi were kirin ji bona ku hevrêziya kurdî li ser erdê pêkwere.**

Piroje hene, wekî KNK'ê ji bo yekîtiya Kurdî, bi taybet konfiransa ji bo Lozanê gelekî serkeftî bû, 650 kesayetên bi bandor beşdar bûn û bandora wê hebe. Niha jî ji bo Yekîtiya Kurdan kongreyeke mezin lidar bixin û bang li hemû partiyên siyasî yên Kurdistanê bikin, heger hatin tiştekî başe, lê heger ne hatin mirov wan ji nav yekîtiya kurdî derbixe.

**5- peywendiyên hikumeta herêmê û hikumeta navendî ya Iraqê di çi astê de ne û ji bona çareseiya pirsgirêkên heyî riyên çareseriyê çine.**

Peywendiyên hikumeta Başur û Hikumeta Navendî di asteke herî xirab de ye. Heya niha me wekî Hikumeta Başurê Kurdistanê tiştek ji gelê xwe re ne kiriye. Divê em hêza xwe ji gelê xwe re pêk bînin û hikumetek bi hêz û yekîtiya xwe pêş bixin. Me hêza xwe û aboriya Kurdistanê derxistiye derve. Heger ew pereyên li derve têne xerc kirin di xizmeta gel de ba, niha em ewqas hewcedarî hikumeta Bexdayê ne dibûn.
Pirsgirêkên kurdan li gel Bexdayê nayên çareser kirin, heger partiyên kurdî Yekîtî û hêza xwe pêş nexin. Dema partiyên Başur bighêjin wê baweriyê ku desthilata wan ne demokrasiye, ne niştimaniye û xizmeta gelê kurd nake. Desthilateke tu têkiliya wê bi gelê Başurê Kurdistanê re nîne. Di van 32 salan de hikmekî aqilane ji bo gelê herêmê ne hatiye kirin. Ji ber wê divê hikumeta Başur xwe ji gel re biçemîne û dest ji hikumetê berde. Ji ber niha hikumet nîne, heger hikumetek teknoqrat were avakirin, wê karibin li gel hikumeta Bexda yê hemû pirsgirêkên heyî çareser bikin.

**6-Êrişên Tirkiye bi hevkariya PDK' ê li ser KNK'ê û li ser firokxaneya Erbede ya Silêmaniyê û armanca êrişan?**

Êrişên li dijî kesayet, rêveber û fermandarên gelê kurd li Başûr û Rojava karekî dijminane, Ev jî bi plan û stratejeyeke mezin tê kirin, dema layanê siyasî û leşkerî yên Kurdistanê têne tesfiyekirin, plana dijminane. Êrişa li dijî Balfirgeha Erbede ya Silêmaniyê û Êrişa li ser navenda KNK'ê ya Hewlêrê ku di saet 1.30'yê nîvro de li herêmeke ewle pêk hat, Hedefgirtina heval Denîz karekî teroristane ye û gelekî metirsyîdar e. Ji ber dewleta Tirk him li Rojava, li Bakur û li Başurê Kurdistanê li beramberî gêrilayan şikestiye, ji lewma berê xwe daya bi karanîna çekên kîmyawî û çekên nukleyer û çekên qedexekirî li ser astên cîhanê, siyasetên sotandina erdê li dijî gelê kurd li her derê dide meşandin.
Careke din jî siyasetên girtin, tirs bikar tîne, wiha jî berê xwe dane bikaranîna diron û berê xwe dane tesfiyekirina şoreşger, siyasetmedar û kesên dikarin rêveberiya gelê kurd bikin, wiha jî dixwaze bandorê li tevgera gelê kurd li çar aliyên Kurdistanê bike.
Navenda KNK'ê bi rezamendiya Hikumeta Başurê Kurdistanê hatiye vekirin û ofîsa wan a li Hewlêrê fermiye û icazeya asayîşa herêmê û dezgehên hikumî hene, danûstandina wan bi hikumeta Herêmê re heye û Birêz Mesûd Barzanî dema serokê herêmê bû ew cih ji wan re hilbijartiye. Divê hevalên li wê derê yên KNK'ê û hemû nûner û xebatkarên sazî û dezgehên din ên Kurdistanê çi nûnerên HDP'ê, çi yên Rojava li vir gerek parastî bin. Berpirsyariya ewlekariya wan ji partiyên desthildar ên Başurê Kurdistanê tê xwestin.
Êrişa bi dironan a li dijî gelê kurd gelek metirsîdar e û roj bi roj ê kîn û nefreta gelê kurd li dji dijminan hîn zêdetir dike. Di heman demê de hêrsa gelê kurd ji bo azadî û demokrasiyê hîn zêdetir dibe, wê hîn berxwedan û tekoşîna gelê kurd ji bo statuya Kurdistanê zêdetir bike.




Xala pir stratejî divê em bizanin ku gelê kurd tekoşîna ji bo azadiya Kurdistana mezin baş bizanin û vê doza bi Amrîka, Fransa, Birîtaniya û hemû aliyan re bidin zanîn. Di heman demê de divê Ew welat û di serî de Serokê Amerîka komkujî, sûc û jinosaytên li dijî gelê kurd têne kirin, nas bikin. Bi taybet niha hêzên kurd li Rojava û Başurê Kurdistanê hevkarên Koalsîyona Navdewletî ya li dijî DAIŞ'ê ne. Bêyî kurdan jî ne mumkin bû ku karîbana DAIŞ'ê Tune bikin. JI ber wê jî durûtî nabe li aliyekî kurdan dixin lîsteya terorê û li aliyê din jî hevkariyê bi wan re dikin. Ji kurdan tê xwestin li ser vê mijarê baş kar bikin, nîfaqa wan êdî nema tê qebûl kirin.
Çareseriya dawî jî ew e ku gereke Amerîka, Fransa û Birîtaniya ye, ew jî azadkirina Abdulah Ocalan e pêkwere û derxistina hemû rêxistin û tevgerên Kurd ji Isîteya terorê ye.

# Sîstema netewdewlet

**Ehmed Hesen**

Li gorî gelek lêkolînvan û dîrokzanên weke Stîvên Wîber, Dêvîd, Widword û Mîşêl Foko dewleta netewe tu carî di encama bikaranîna polîtîkayê de derneketiye, ango polîtîka bi xwe ne jêdereke ku ji aliyê sîstema dewletê ve derketiye, herwiha rêber APO vê rastiyê bi gotina "dewlet sînordarkirina azadiyan e" teqez dike ku dewleta netewe şaxê bingehîn ê pêşxistina pirsgirêkên civakî ye, ez dikarim destnîşan bikim ku sîstema dewleta netewe encama bîrdoziya navendî ya pênc hezar sal e ku weke gilokeke pirsgirêkan e, kêlî bi kêlî mezin bûye û çînîtî di hemû hûrgilîyên civakê yên çandî de çêkiriye, mirov vê sîstemê bi zihniyeta baviksalar a pênc hezar sal ve girê bide wê dihatir nêzî heqîqetê be, ji ber ku çavkaniya xwe ji zihniyeta zilamsalariyê ya ku her heyîneke rihber biçûk dixîne û wateya wê ji dest dide, dike mîna amûrên objeyî çawa bixwaze dîzayîn dike.
Rêber APO dewleta netewe weke xwedayê bi maske yê ku daketiye ser rûyê erdê pênase dike ev tesbîteke bê qusure û di cih de ye, ji ber ku bi qasî ku rola baweriyên yekxwedayî û serdestiya dêran ji dest çûye, ewqas jî sîstema civakan ber bi navendbûyînê ve hatiye birin, ango polîtîkaya parçe bike û bi rêve bibe ketiye meriyetê, di dîrokê de bi qasî dewleta netewe tu sîstemên yekdestdar nikarîne civakan ji nasnameya wan bê par bihêlin û bikin bê hebûn,ji wê zêdetir ji xwezaya civakî bê par hiştine, çawa ku di efsaneyên Sumerî de jin weke ku ji parsûyên zilam çêbûye hat pênasekirin di sîstema kapîtalîzmê ya roja îro de jî azadiya ferd û civakan bi dirûşmeya dewleta netewe li ber destara asîmîlekirinê ket û hate hêran, di bin navê sîstema dewleta netewe de nirxên civakan, azadiya civakan, pergala exlaqî ya koma mirovan bi bombeyên nîjadperestiya çors têne îmhakirin,silogana yek netew, yek ziman,yek ol û di bin serweriya sîstemeke şoven de dawî li azadiya ferd û civakê aniye û daye pişaftin, ji vê zêdetir di bin navê azadiyê de koletiya mezin, di bin navê sosyalîzmê de nîjadperestî,di bin navê parastinê de heya dawiyê qirkirina çandî û fîzîkî bûne para civakên bê qabîleya xweparastin û polîtîkayê, sîstema dewletê van hemûyan dike maskeya rûyê xwe yê veşartî û bi zagonên dûrî rêgez û pîvanên civakî cîla dike û dipejirîne, di heman demê de berhemdarê yekemîn e ku ji sîstema kapîtalîst a gilobal re xizmeteke heya dawiyê pêşkêş dike, gava derî li protestokirin û redkirinê vedibe û hêza wê ya polîtîkayê têrê nake ku rewşê aram bike serî li bikaranîna hemû cure teknîkên leşkerî dide û hêza hesin bi kar tîne, ev yek hem qeyranên fîzîkî bi xwe re tîne û hem jî hewîrdor û binesaziya heyî hildiweşîne, ji ber vê yekê jî çare namîne û bi xwe jî têk diçe,têkçûna wê bi destpêkirina serhildanên gelên çîna piroleter, karker û azadîxwazan temam dibe, ji ber ku tu hêz bi qasî hêza gelê xwedî însîyatîfa berxwedanê û xweparastinê tunene ku karibin xwe li ber ragirin,lê ger ku hêza civakê ya derxistina pirojeyeke xweparastin û xwerêvebirinê nebe ne dikare zordariya sîstemê têk bibe û ne jî dikare şoreşê bi ser bixe,bi vê yekê wê xwekujiyeke mezin bi ser xwe de bîne û bi qirkirina mezin re rû be rû be.



# Li hember guhartina demografîk cîhan bê deng e

Kiryarên dagirkeriya Tirkiyê û siyaseta guhartina damografiya herêmên dagirkirî bi polîtîkeyên herî zirav tên pêk anîn. Li hember vê yekê Rêveberiya Xweser a Kantona Efrîn û Şehba bi daxuyaniyekê siyaseta ku li Efrîn, Bab, Ezaz, Serê kaniyê û Girê Spî tê meşandin red kirin û banga hêzên navnetewî kirin.

**Vîndar Roj/ Şehba**

Siyaseta faşîzma Tirkiyê ya ku li herêmêm dagirkirî dide meşandin, bi awayekî ji rêzê û rewa weke ku ew herêm girêdayî xaka Tirkiyê ne û bi rengekî rewa ji milê dewleta tirk a faşî, li ber çavên cîhanê û hêzên navnetewî guhartina demografîk li herêmên dagirkirî pêktîne. Di hundir van herêman de tavahî binpêkirinên bê exlaqî li ser serê gelê resen tê meşandin. Dibistan û zanîngehên bi zimanê Tirkî hatine vekirin, zarokên gelê resen li ser zimanê Tirkî tên perwerde kirin. Pereyên Sûrî êdî hatine qedexekirin û leyreya Tirkî tê bi kar anîn. Li şûna mal û milkên gelê herêmê, koçberên ji derve tînin û li şûna wan bi cih dikin. Herwiha bi sedan malên mêtîngeriyê hatine avakirin. Ev siyaseta ku tê meşandin qirkirina çand, ziman, nasname û hebûna gelê resen e dike hedef. Herwiha li hember vê yekî tavahî rêxistinên navnetewî bê dengin û bi vê bêdengbûyînê re hevkariya wan tê diyar kirin.
Di dîroka 26 ê Îlonê de Rêveberiya Xweser a Kantona Efrîn û Şehbayê tevê sazî û partiyên li herêmê, li hember siyaseta ku di Efrîn û herêmên dagikirî de tê kirin daxuyaniyeke nivîskî ji raya giştî re dan. Têkildarî vê yekê Rêveberiya meclîsa Sûriya Demokratîk Bêrîvan Elî û Endamê Saziya Meclîsa Malbatên Şehîdan Ednan Şêx Mihemed ji rojnameya me re axivîn.

**'Efrîn wargeha aşîtî û aramiyê bû'**

Birîvan di destpêkê de anî ziman ku herêma Efrînê di destpêka aloziya sûriyê de,5 hezar koçber pêşwazî kir û xwedî li wan derket û wiha domand:"Di destpêka aloziya Sûriyê de û piştî îlankirina Rêveberiya Xweser. Herêma Efrînê ji ber herêma herî ku bi ewle û aşîtyane jiyan dikir deriyê xwe ji tavahî gelên derdor re vekir û 5 hezar koçber di nava xwe de bê ferq û cudahî hembêz kir. Lê ji ber herêma Efrînê di nava pilanên dagikeriya Tirkiyê de bû di 20 ê Çileya 2018 an de, faşîzma Tikiyê bi teknîk û çekên herî pêşketî yên NATO yê Efrîn armac girt".

**"Kiryarên Faşîzma Tirkiyê hemû pîvanên mirovî binpêkirine"**

Birîvan diyar kir ku bi dagikirina Efrînê tavahî binpêkirinên bê exlaqî hatin kirin û wiha domand: "Dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên girêdayî wê piştî dagirkirinê hemû pîvan û nirxên mirovahiyê binpêkirin û dest bi talan û kuştin kirin. tavahî axa Efrînê hat talan kirin û ser erd û bin erda wê hat wêran kirin. Dar û daristan hatin qut kirin û şewtandin. Bi hezara hemwelatiyên resen ji malên xwe hatin derxistin û li şûna wan gelê biyanî hatin bi cih kirin. Bi hezaran zarok, jin, ciwan û pîremêr hatin kuştrin û di zîndanên dagirkeriyê de hatin ceza kirin. Rojane jinên Kurd bi destê çete û leşkerên Tirk tên revandin û tecawîz kirin. Ji bilî van sûcan bi dehan malên mêtîngeriyê bi destên hevkarê faşîzma Tirkiyê yên weke qeter, Kiwêt û komeleyên Filîstînî hatine avakirin û guhartina damografiya herêma Efrînê tê kirin. Li hember vê yekê ji neçarî gelê resen bê çare ma ye û di bin zexta dagikeriyê de nefes werdigire".



ednan şêx mihemed



birîvan elî

**"Di rewa kirina dagirkeriyê de hemû hêz û rêxistinên navnetewî hevkarin"**

Herwiha Ednan Şêx Mihemed destnîşan kir ku li ser wehşiyeta faşîzma Tirkiye dewletên navnetewî çavên xwe girtine û wiha got: "Ji 6 salan ve dagirkeriya Tirkiyê bi awayekî pir rihet û rewa kiryarên xwe yên dagirkirinê li ser serê gelê herêmê pêk tîne. Ev guhartin û qirkirinên ku tên pêkanîn li ber çavên hemû cîhanê tên kirin. Lê belê rûxmî ku hemû pîvanên derveyî mirovî der heqê gelekî de tê kirin û ji cewher tên derxistin. Raya giştî û hêzên navnetewî ker, lal û kur in. Weke ku dagirkirina welatekî pir ji rêzê ye û tu hesab xwestin nayê xwstin. Di van pilanan de diyar dibe ku hemû hêz û rêxistinên navnetewî alîgirê dagirkeriya Tirkiyî ne û ji bo rewa kirina vê yekê hevkarin".
Ednan bi van gotinan axaftina xwe bi dawî kir: "Em banga tavahî rêxistinên navnetwî yên ku mafê mirovahiyê diparêzin dikin ku, li hember binpêkirin û sucên di Efrîn û herêmên dagirkirî de tên kirin xwe berpirisyar bibînin û bi erkên xwe rabin".

# Armanca şerê taybet qirkirina civakê ye

**Deriya Çiya/Qamişlo**

**Cîhan Husên Qomîteya têkiliyên doblomasî ya TEV-DEM diyar kir ku dagirkeriya Tirk di kesayeta jin û ciwanan de Şoreşa Rojava dike armanc û got, dagirkerî bi riya teşwîqkirin koçberiyê dixwaze Şoreşê têk bib e.**

Wekî tê zanîn Şerê taybet bi gelek rêbazan tê meşandin û (şerê psîkolojîk, şerê sar, şerê nerim, şûştina mêjî û hwd) digre nava xwe. Dema gotina şer tê gotin şidet, dijwarî û kuştin tê bîra mirov. Lê şerê taybet berûvajî wê ye, li rex şidetê û dijwariya fîzîkî her rêbaz tê bikaranîn ji bona ku kes û civak were parçe kirin û bê parastin bimîne. Şerê taybet civakê dike di nava xeflet û rewşeke ku ew xwe nizane ku çi jiyan dike û ne di wê ferqêdeye ku çi li ser tê meşandin û xwe bi çi rengî ji rewşa ku têde jiyan dike derbêxe. Ji ber wê gelek caran ew bixwe dibe amûrê xizmeta armancên dijmin. Dîroka pêkanîna rêbazên şerê taybet ne nû ye. Lewra şerê li hemberî xistina mêjî û kolekirina mirov, xwediyê dîrokeke kevnar e. Lê em dikarin bêjin ku ev şer rêbaz û şêwazên xwe li gorî merc û rewşên heyî diguherîne.
Piştî herdû şerên cîhanê ku bi milyonan mirov bûn qurbanî. Dewletên kapîtalîst dîtin ku wê nikaribin beramberî hêz, vîn û îradeya gelan temenê xwe bi şideta fizîkî dirêj bikin û serdestiya



xwe bisepînin û berjewendiyên xwe bi dest bixin. Ji ber wê amûrên ku mirov bi kar tînin weke zanist, teknîk, spor, tendirustî, zayendî û hwd. Tev kirin bin kontrola xwe. Dewletên kapîtalîst, ji bo guhertina mêjiyê mirovan, dûrxistina wan ji armanca wan a sereke û mijûlkirina wan bi tiştên bêwate, şerê taybet pêş xistin.
Girêdayî şerê taybet yê ku li ser civakê û di serî de li ser jin û ciwanan tê meşandin û ji bo berfirehiya mijarê Cîhan Husên Qomîteya têkiliyên doblomasî ya TEV-DEM ji rojnameya me re axivî.

**'Şerê taybet civakê dike armanc'**

Cîhan Husên Qomîteya têkiliyên doblomasî ya TEV-DEM, da zanîn ku bi vî şerê ku niha tê meşandin dixwazin fikirê serokatî yê ji bo demuqrasiyê pûçbikin û bi hemû awayî bingeha civakê dikin armanc û wiha got:" Em dibînin ku îro bi meliyonan mirov li dov vî fikirê demukrat yê ji bo aştîiyê û azadiyê kom bûne. Ji ber vê yekê sistema serdestê cîhanê bi hemû rêbazên gemar û qirêj li hemberî remanê Rêbertî yê ji bona azadî û demukrasiyê şerekî bê sînor dide meşandin. Herweha."Dijmin di hundirê vî şerî de dixwaze destkeftiyên kurdan tune bike û bi taybet destkeftiyên ku li Rojava pêkhatine. Ji ber wekî em dizanin ku şoreşa Rojava bû xwediyê destkeftiyên pir mezin, ne tenê ji bo gelê kurd, lê ji bona tevahî mirovahiyê jî bû hêviya azadiyê. Dagirkerî dixwaze bi riya şerê taybet destkeftiyên ku pêkhatine ji holê rakin. Li hemberî planên şerê taybet yê ku li ser civakê tê meşandin, gel bi hemû hêz û vîna xwe di nava berxwedanê de ye, û li ser bingehê şerê gelê şoreşgerî wê gel li berxwe bide û bi ser bikeve. Herweha heya ku em vî şerê taybet pûç bikin pêwîste ku em xwe bi remanê Rêber Apo gurçûpêç bikin û bi şev û roj di nava kar û xebatê de bin.

**'Dagirkerî hemû rêbazên şer li ser civakê dide meşandin'**

Cîhan Husên diyar kir ku dagirkerî li kêleka êrîşên leşkerî, şerekî taybet jî li ser civakê dide meşandin û got: Qoaxa ku niha em têre derbas dibin qonaxa şerê cîhanê yê sêyemîn e, û di vî şerî de kesê ku tê hedef girtin hemû kurdin, ji ber ku kurd xwedî nasname, hêz, îrade û fikrekî demukratin. Ji ber vê yekê jî şerekî mezin li hember gelê Kurd di vê qonaxê de tê meşandin, dixwazin civak bê îrade, bê hêz û hebûna wî ji holê rakin.

**'Di şerê taybet de jin û ciwan zêdetir tên hedefgirtin'**

Dewleta Tirk a dagirker bi tevahiya hêza xwe ya leşkerî êrîşên hovane li ser herêmên bakur û Rojhilatê Sûriyê dide meşandin. Di nav de jî şerê taybet li ser jin û ciwanan bêhtirî xwe dide meşandin. Ji ber ku jin û ciwan bingehê civakêne û ji bona vê yekê di serî de bi riya madeyên hişbir, torên medyaya civakî, belavkirina fihûşê û teşwîqkirina ciwana li ser koçberiyê dixwazin vê civakê têk bibin. Herwiha wek em dizanin di demên berê de jin tenê girêdayî mal û karê malê bû, lê roja me ya îro bi saya fikirê Rêber Apo jinê cihê xwe di nava hemû kar û xebatan de girtiya. Ji ber vê sedemê dagirkerî û bi riya şerê taybet di serî de jin û ciwanan dike hef û dixwaze bi riya vê yekê jî li ser civakê qirkirineke çandî pêkbîne.

FENER

## Rêwîtiya şervanekî heqîqetê



**Idrîs Henan**

Kesayeta li gorî pêdiviyên teşegirtina jiyana xwe tevbigere, heqîqet bi xwe re ava dike. Berovajî; kesayeta li gorî heqîqeta xwe jiyan neke, xwe înkar dike û li derveyî pêdiviyên teşegirtinên jiyanî, bi berovajiyan re yekirin û xwehomojenkirin e. Yanê; ji rêya xwezaya civakê derketin e. Bi gotinek din; her tespîtek, hebûnek, statuyek û pozisyonek derveyî çarçoveya tiştan de were destgirtin, dûrketina ji heqîqet ye. Lew re jî mirov di oxira wê de can dibexşîne û fena ebdalekî dikeve ser rêya lêgerîna li heqîqetê.
Ji bona ku mirov bibe rêwiyê heqîqetê jî, pêwîste şoreşgerek bi heyvanê exlaq, polotîk re hatibe strandin. Ji ber ku cewherê şoreşgeriya ku cudabûnê qebûl dike heqîqet e. Ji bo gihandina wê jî rêwiyên bi xwezaya civakî re bûne rastiyek ku yekparebûna mirov û civakê esas digirin gerek in. Ango; pêşengên ku tarîtiyê ronî bikin, rêya azadiyê nîşan bidin, bi xwîn û xwêdana xwe, damarên kokên ziwa bivejînin û ji nû ve jiyana rast a bi xwezaya mirov û civakê re yek parç ye, biafirînin. Bi gotinek din; milîtanên pêşeng ên xeta jiyana azad in ku pêvanên serkeftinê li gorî felsefeya hebûna bi rûmet raber dikin. Belê; ew in şoreşgerên Ragihandina Azad, siwarên heqîqetê û lingê tendirust a civaka exlaq û polotîk in.
Xeta ku bi Mazlûman re dest pê kiriye, bi Gurbetellî Ersoz, Nûjiyan Erhan, Denîz Firat, Qasim Engîn û Dozdar Hemo re dewam kiriye, bi Seyîd Evranan re jî gihaye lûtkeyê û ber bi mutleqbûnê ve gav avêtiye. Veguheriye hêza bingehîn a hevaltî, têkoşîn û serkeftinê. Heval Seyid Evran bi taybetmendî û hefîzeya xwe ya keda dehan salan, cihekî giranbuha tije wate li her derê xebat kiriye, girtiye û nirxên têkoşîna azadiyê û destkeftiyên gelan parastiye.
Rêheval Seyîd li her dera maye bûye xwedî muhr û eserek li pey xwe hiştye. Ji xwe di nameya xwe ya dawî de, ev yek baş vegotiye: Ji Amedê heta Xerzanê, ji Efrînê heta Qamişloyê, ji Zapê heta Silêmaniyê, ji Ûrmiyê het Mahabadê ez li her derê bûm. Niha aliyekî min Bakur e, aliyekî min Rojava ye, aliyekî min Başûr e, aliyekî min Rojhilat e. Ez bi temamî bûm Kurdistan. Êdî bi milyonan mirov li pey min hene û wê vê kevneşopiyê dewam bikin.
Îro jî keda heval Seyîd daye berbiçav e ku li pey xwe artêşek ragihandvanên heqîqetê hiştiye. Xwedî wê rola mezin a sazûmankirina wê artêşê ye ku li dijî çi cureyên paşverûtî û kevneperestiyê, berxwedana heqîqetê birêxistin kiriye û ala ku ji bapîrê xwe wergirtiye, dest bi dest, mil bi mil, li jor hiştiye.
Ji bona ku ragihandin li gorî pêdiviyên teşegirtinê bi heqîqeta ku Seyîd Evran û hevrêyên wî avakirine re bibin yek beden, pêwîste xwedî li milîtanî û şoreşgeriya Seyîd Evran derkeve û şopdarê xeta ku wî nexişandiye be. Rêheval Seyîd ji bo kêliyên jiyanê bi wate bike, têkoşînek mezin raber kiriye. Bê guman dema ku heval Seyîd di peyama xwe ya dawî de gotye: "Ji bo wate li her kêliya jiyanê bê kirin pêwîstî bi têkoşîneke mezin heye. Min jî ji bo vê wateyê têkoşîneke mezin meşand. Ez Kurd bûm û diviya bû gelê min azad bibûya. Ji bo vê jî heta nefesa xwe ya dawî min pênûs û kameraya xwe bi kar anî û gotina xwe got. Niha bala xwe didimê, çend nifş guherîn? Ya ku pê zanim ew e ku em her roj zêde bûn" ravekirina herî guncaw û rast a rêwîtiya şervanekî heqîqetê ye.